Berlin, di 29. 8. 1989 de

Birayê Serdar !

Ez bi dîtina te pir dilşadbûm, her wehajî ez te û Malîya te ji mêvandarîya we pir sipasdikim. Bi rastî ew rojên kurt piştî derbasbûna çardeh salan zor xweşbûn. Ez hêvîdarîm, ku tu dê li gel Malîya xwe û Zarokan ji bona çend rojan serdane me bide kirin.

Birayê Hêja!

Bi biryarîya me di 19.8.1989 de li Bajarê Monîxê bi derkirina Kovereke Kurdî li gel hev me bi rast û durûstî tevaya xewnên zarotîya xwe û hêjî bêtir biserdejî pir pêwistîya giring ji bona vî karê hanê date bicihanîn. Derkirina kovareke wisa bi Zimanê meyî şêrîn û xweş gaveke pirî giringî mêjûyî ji bona pêşvexistina zimanê me û şiyarkirina Gelê me li ser bingehê Demokrasîkirin û zanistîkirina Pirsiyarîya Welatê me dide bipêşvexistin. Raste ev karê hanê pir westandin û ser êşandin jê re dide xwestin, lê tevlivêjî ez hêvîdarim, ku emê bi alîkarîya heval, hogir û dilsozên Welatê xwe bi vî karê perest bikaribin bêtin rabûn.

Min li Berlina Rojava li gel çend Biraderên zana di warê zimanê me de li ser vî karê hanê date axivtin. Ew bi vî karê hanê pir dilşad û bextiyarbûn û wan tevaya amadebûna xwe û alîkarîya xwe ji bona bi serketina vî karê hanê, çi di warê nivîsandinê, yarmetîyê û belavkirinê de datin derxistin. Her wehajî wan ji min re datin sozkirin, ku ew pirsa Postê û Konto dê bidin çarekirin. Wan ew herdû kar ji bona ser milên xwe datin hildan. Em li bendê Berseva te ne. Her wehajî ez li gel Biraderên Elemanya Rojavajî peyivîm. Wan jî pir bi dilşadî ev karê hanê datin dîtîn û xwe ji dil û can dane ber. Her weha jî ez li gel Pirsiyarên Partî li Ewropa li ser vê Kovarê axivtim. Wan jî pir bi dilşadî tevaya alîkarîya xwe ji me re di vî karî û di vî warî de datin derxistin. Wana alîkarîya belavkirina wêna li tevay Ewropa bi ser milên xwe ve dane hildan, ger ku em bixwazin. Her wehajî ji bona civandina hemû Gotarên Rojnamên Derwê li ser Kurdistanê di Rêya Partî de dê ew ji me rē bidin civandin, wergerandin û rêkirin. Bi kurtî wan zosên pir qenc û çê ji me re dane dan. Ez gûman dikim, ku dê di vî warê hanê de ji dil û can pişta me bidin kirtin. Her wehajî îro ez nameyekî ji bona Kak Felek, Berpirsîyarê Dengê Kurdistanê û Serokê Beşê Ragiyandin di Mekteba Sîyasîyî Partî de ji bona mebesta Kovara me didim rêkirin. Ez baş dizanim, ku dê ew ji dil û can pişta vê Kovara me bide girtin, her wehajî dê ew ji bona wê pir dê bide nivîsandin. Wehajî dê ez nameyekî li ser vê mebestê ji bona Firensa, Siwêdê, Sovyêtê, Polonya, Alemanya Rojava, Nemsa û cihên din bidim nivîsandin.

Li gora bîr û bawerîya min derkirina Kovara me dê pir bête biserketin, ger ku em tanî salekê diravîya wê bikaribin bi ser milên xwe ve bidin hilgirtin. Me ji bona derkirina vê kovarê soz bi ser milên xwe ve dayîte hildan. Ez hêvîdarim, ku tu di warê diravî de dê vî barê hanê bi ser milên xwe ve bide hildan.

Ez ji te re çend nivîsînên Kurdî didim rêkirin û her wehajî dê ezê ji te re Ferhanga Kurmancî û çend pirtûkên din jî di pişt re bidim rêkirin.

Silavên min û Berbera pir ji bona Malîya te têtin rêkirin û ez çavên zarokên te didim maçîkirin.

Birayê te

Berlin, di 30. 8. 1989 de

Birayê hêja Felek!

Ji mêj de min di xwest, ku ez ji bona te bidim nivîsandin. Min her çar pirsa rewşa jîna te ji Heval û Nasan dida kirin. Her wehajî min çavdêrîya nameyên te ji xwe re dida kirin.

Ji bedbextîya nezanîyá me pir derd, êş, kul û ketin di mêjûwê de bi ser serên me de hatine ketin. Hêjî em girtîyê nezanîya xwe ne. Hêjî û her û her bêtir jî èm pir ji têgihiştina naveroka Pirsiyarîya xweyî Milî û Çarekirina wê dûrin.

Min bi wirdî, hûr û kûrî Nivîstokên teyî rêkirî ji xwe re dane xwendin. Ez pir bi wan dilşad û bextiyarbûm. Li gor bîr û bawerîya min tu pir bi başî li ser çarekirina Pirsa Welatî dide nivîsandin û Her wehajî tu bi sadebûn û diyarî tevaya cewhera wê ji bona Xelkên kurdistanê re dide derxistin. Bi rastî evaya cewhera karê Zana û Şiyarvanên Kurdistanê di vê qonaxa meyî mêjû bi xwe de ye. Divê em şev û rojê vî Miletê Bedbext li ser mêjûwa wî, li ser rewşa wîyî siyasî, li ser rûdanên dorhêla wî, li ser zîneta Cêhanê û hêzên têde kêrkirî bidin agehdarkirin, da ku ew bi kurttirin dem û kêmtirin gorî bi serxwebûna welatê xwe bête gihaştin. Evaya karekî pirî dujwar û sengîn têtê dîtin, lê tevlîvêjî em bivên yanjî nevên, evaya bi xwe jî jîn li ser me dide neçarkirin.

Ez li gel Heval û Biraderên me li ser rewşa meyî nuh pir axivîm. Bi diyarî têtê derketin, ku belê dûr yanjî nêzîk di vî warê hanê de jî bîr û bawerîya min û ya te pir nêzîkî hevin. Ez hêvîdarim, ku di vê roja teng de dê em tev bi hev re bikaribin xwe bi serfirazî, serbilindî, bi zanebûn û dilsozî bidin rizgarkirin û bi armancên Welatê xwe bêtin gihaştin.

Xwezî tu, ger ku demeke kurt jî ba, bihata Ewropa; ji ber dûr yan nêzîk tevaya xebata Kurdistanê ji bona demeke kurt li Ewropa bi neçarî têtê civandin û ji vir careke din bi şêweyekî zanistîyî pirî xurt li ser bingehê, demokrasîkirina Pirsiyarîya Welatî ji bona Kurdistanê bi hêvîya biserketina xwe ve têtê vegerandin. Ev pêla me rûpelekî nuh ji bona xebata me bi neçarî dide vekirin û ew vê carê nema ne ji Iranê, Turkî, Iraqê û ne jî ji Surî têtê destpêkirin, lêbelê ew vê carê ji Ewropa û li ser serpêhatîya tevaya demên vejandina Miletên din têtê avakirin. Bi vî rengî di mêjûwa xebata me de carê pêşîye, ku biserketina me di Serxwebûna Welatê me de bi hêvî têtê dîtin.

Birayê Hêja !

Min û te zor li ser cihê şiyarkirina Milî dayite axivtin, ku bêyî vêna dê her û her Rêberê me Nezanê me bin û dê her Nezanê me Rêberê me bin. Rêber jî ezmanan nayêtin xwar, lêbelê ew ji nava Miletê xwe têtin derketin. Ew bi xwe jî wêneyê zanebûna wî bi xwe ne.

Di vî warê han de cihekî pirî mezin ji Zimanê Zikmakî re ji bona vejandina Şiyarkirina Milî têtê wergirtin. Milet bi gelemperîya xwe ve divê li ser mêjûwa xwe, li ser Zîneta xwe bête şiyarkirin. Bêyî vêna dê em her û her di nava bazinê nezanîya xwe de bêtin gerandin û surandin û hêjî bêtir bi serdejî dê emê her û her di nava Welatê xwe de, di nava xwîna xwe de bêtin vegevezandin.

Weha piştî remankirineke pirî dûr û dirêj ez ji Berlinê ji bona Bajarê Monîxê ji bona nik Kak Sêrdar Araratî çûm, da ku em bi hev re Kovareke Kurdîyî Mehane bidin derkirin, da ku Têde bi şêweyekî Zanistî û li ser bingehê Demokrasî li ser Çarekirina Pirsiyarîya Kurd bête nivîsandin. Weha bi vî rengî dê ew dergehê xwe ji bona tevaya Zanevanên kurdistanê bide vekirin û bîr û bawerîyên wanî cuda li ser rûpelên xwe bi de derxistin.

Li ser Zanistîkirin û Demokrasîkirina Pirsiyarîya Kurd di Kovekareke Kurdî de li Ewropa ez û Kak Serdar di 19. 8. 1989 de bi hev hatin gihaştin, Ku em kovara

xwe di nêzîka sê mehên tên de pê bidin destpêkirin. Ew nala Xwedîyê wê Kovarê û ez jî nala Sernivîskar bête destnîşankirin.

Weha ez hêvîdarim, ku tu jî bi hemû tuwana xwe ve rûpelên vê Kovara hanê bi bîr û bawerîyên xweyî pir bi nerx bide xemilandin û dê tu her û her li dûhev ji bona Kovara me lêverînên xweyî pir dirêj li ser rewşa xebata Kurdistanê li nivîsandin, weha emê wan xweser bi wî corî bidin belavkirin. Ger ku tu wan bi tîpên Latînî bide wan ji bona Kurmancî bidim wergerandin. Ger tu bixwazî, ez herdû Zaravan Kovara xwe bida derxistin. Xwezî me bi tîpên latînî bikarîba bi. Her wehajî ez ji te hêvîdarim, ku tu dê Nivîsvanên kurd li dora vê Kovara hanê bide civandin. Hûn tev li ser navnîşa min li gel vê Kovarê dikarin bidin dan û sitendin.

Silavên xwe, yên Berbera û Ciwan pir ji bona Hevalan tevan û ji bona Malîya te em didin rêkirin. Ez têm çavên Zarokên te. Ez çavdêrê, benderawê bersevа te me

Birayê

te

Têbînî: Birayê hêja di dema xwe de nêzîka 4000. Markên te li nik min mabûn. Min jê nêzika 400. Markî ji bona Keça te li Piragê date rêkirin. Ji ber destengîya min weha ez ji bona te pişneyar dikim. Herdû Ferşên min, yên ku min ew bitir ji 2000. Mark dabû kirîn, ji bona te bêtin hiştin û ez dê ji te re 1600. Markên mayî ji bona wî cihî bidim rêkirin, ji yê ku te xwest. Weha ez gûman dikim, dê evaya bi xwe ji him ji min û him jî te re baştirîn alîkarî bête dîtin. Ez çavdêrîya bersevа te dikim.

Berlin, di 1.9. 1989 de

Dr. M. S. Gouma
1147 Berlin
Mullerstr. 56
PF. 210 - 16.
D D R

Birayê Hêja Seydayê Necmidîn !

Îro min nameya te wergirt. Ez pê pir dilşadbûn. Ez te li ser rêkirina wê pir didim sipaskirin. Naveroka wê li ser rewş û zîneta Welatê me hinav û cegerên Mirovan didin sûtandin. Tevaya kul, derd, êş û serêşandinên me, na hêjî bêtir tevaya destanên mêjûwa me bi carekê ji bedbextîya nezanîya me bi ser serên me de tên barandin. Nezanên me Rêberên me û Reben me nazanên me. Ew bi xwe jî mirêka şiyarkirina Miletê me ji me re û her wehajî ji tevaya cîhanê re bi carekê didin wênekirin. Hemû bedbextîya me bi carekê di nezanîya me de tête dîtin.

Weha bi vî rengî donê min nameyeke dûr û dirêj li ser rewş û zineta xebata me ji bona Kak Felek date nivîsandin. Ezê wêneyê wê ji bona agehdarîya te ji te re bidim rêkirin.

Birayê hêja! Birastî tu û her wehajî Kak Felek pir li ber dilên min zor şêrinin. Pir caran ez bi rastî bêrîya we didim kirin. Xwezî me careke din nala berê hevdû bida dîtin û pir bîr û bawerîyên xwe li ser pirsiyariya kurd bi hev re bida guhertin. Bi rastî ez ji we pir hîn û fêrî siyasetê bûm.

Li ser pir pirsên te kirin, bersevên wan di nameya Felek de têtin dîtin, her wehajî di berseva Mesud li ser pirsên Rojmana Pirsiyarên Demokratî Kurdistan û ya Kawa têtin dîtin. Ew bi 16. Pelan hatin bersev dan. Min ew bersevên hanê li ser navê Kak Mesûd ji wan re dane dan. her wehajî daneyek jê ji bona kak Felek hatîye rêkirin. ezê pir dilşadbim, ger ku tu bi wan çavekî bide lêxistin. tevaya têgihiştina dîtina xwe li ser mêjûwa Kurd û Kurdistanê û her wehajî li ser rewşa meyî nehajî min dayite derxistin.
Lê li vê derê jî ez dixwazim ji te re careke din jî bi kurtî bidim derxistin, ku Xebata me deha û deha hatîye dijwarkirin. Zanebûneke pir mezin, Dilsozîyeke pir xurt û bînfirehbûneke pirî kûr jê re divê bête dîtin. Evaya dûr yanjî nêzîk bi neçarî dê bête peydakirin. Vê carê dûr yanjî nêzîk xebata me Kurdan li sernaserî Kurdistanê ji bona demeke kurt li Ewropa tête civandin û ji vir careke din li ser bingehê zanistîyê û demokrasîyê ji bona Kurdistanê tête vegerandin. Weha bi vî rengî evaya tevaya serpêhatîya dema vejandina pir Miletan dide derxistin, ji ber vê jî xwezî jî tu û her wehajî Felek bi malitî jî ji bona Ewropa bihatana derketin. Mana wê li Iranê hiç qazanc û berjewendîyek têde tête nayête dîtin. Bi xurayî hûn jîna xwe li wê derê didin berbatkirin û windakirin.

Ez pir li ser rewşa meyî neha li gel Kak Mesûd hatime axivtin. Pir bawerîyên min ew guhê xwe bi wan dide dan û her wehajî piranîya wan jî bi serê wî tên ketin. Ez pir hêvîdarim, ku careke din emê hevdû bidin dîtin. Her wehajî ez pir kêfxweşbûm bi nêta rêkirina lawê te ji bona Çêksilovakya, da ku ew li wê derê ji xwe re bide xwendin.

Di dema mirina kak Idrîs de min Viza xwe ji bona Îranê û her wehajî Bileta Belafirê ji bona hatina Iranê li gel Kak Dilşad date amedekirin. Lê li ser navê Kak Şêx Xalid ji me re hate rêkirin, ku ew naxwaze Kesek ji bona Iranê ji bona serdana wan bête danakirin. Weha bi vî rengî min dev ji hatina Iranê û serdana Şûna Idrîs date berdan. Lêbelê weke ku min di pişt re bihîst, ku evaya jî li ser navê kak Şêx Xalîd ji bal Mekteba Siyasî hatîbû rêkirin.

Birayê Hêja!

Ji mêj de ez di warê pêşvexistina zimanê meyî şêrin de didim xebatkirin. Min di nava van salên çûyî de pir Nivîstok, Pirtûk ji zimanên bêgane li ser mêjûwa Kurd û kurdistanê ji bona zimanê me dane wergerandin. Nehajî hêjî ez bi dil û can bi vî karê hanê ji bona şîyarkirina Miletê me bi zimanê wîyî zikmakî li ser mêjûwa wî didim karkirin. Her wehajî vaye ez dixwazim li gel kak Serdar ji Kurdistana Turkî Kovekere kurdî bi Latinî li ser zanistîkirina û demokrasîkirina pirsiyarîya meyî Milî li Ewropa bidim derxistin. Ez hêvîdarim, ku ez dê serdaneke we li îranê bidim kirin.

Ciwan neha di xwendina xwe de, di Elektironîkê de di sala çaran de ye. Ew niha ji bona şeş mehan ji bona Mosko ji bona amadekirana Diploma xwe ji bal Dewltê hatîye rêkirin.
Ez û Dêya ciwan ji bona te, Malîya te û Zarokên te silavên xwe didin rêkirin. Em xweşîya we tevan dixwazin. Silav ji bona hemû havaln re didim rêkirin û xweşîya wanan tevan dixwazim. Ez hêvîdarim, ku nameyên me bi pirbûn li gelhev dê bêtin çûn û hatin. Ez çavdêrê, bendewarê nameya te me.

Birayê te